# Bultena Çandiniyê ya HDPê

**ÇİLE /2020**
**Hejmar:01**

**DEYNÊ COTKARAN 64 QAT ZÊDE BÛ**

**MÎQDARA KREDİYÊN KU KETİNE TEQÎBATÊ *4,3MİLYAR TL***

**8 HEZAR COTKAR BÛNE ÎCRAYÎ.**

**2 MİLYON COTKAR NİHA BÊKAR İN.**

**700 HEZAR COTKAR Jİ PERGALA QEYDİNİYÊ YA COTKARAN VEQETİYANE,**

**Dİ 20 SALÊN DAWÎ DE Jİ %12 KÊM BÛNE**

## Dİ SERDEMA AKPÊ DE COTKAR ÊDÎ NIKARIN HILBERÎNIN, JI BER KU DEYNDAR IN


- Di sala 2002an de deynê cotkaran 2,5 milyar TL bû, lê di Îlona 2019an de ev deyn 64 qat zêde bû û niha nêzî 160 milyar TL ye.
- Di Berfanbara 2018an de mîqdara krediyên ku ketine teqîbatê 3,8 milyar TL bû, lê di Hezîrana 2019an de ev mîqdar li gorî heman meha sala borî, ji %54,8 zêde bû gihişte 4,3 milyaran.
- Di 9 mehên pêşîn ên sala 2019an de, di qadên wek çandinî, nêçîrvanî û daristanvaniyê de mîqdara krediyên çandiniyê ya ku hate bikaranîn, 115 milyar 193 milyon TL ye.
- Di sala 2004an de meblaxa deynê krediyên ku nehatibû dayîn 211 milyon TL bû, lê di sala 2019an de meblaxa krediyên ku ketine teqîbatê, 4 milyar 820 milyon TL ye.
- Li gorî daneyên BDDKyê (Dezgeha Sazkirin û Vênêrîn a Bankayan) di sala 2004an de deynê neqdî yê cotkaran ji %1928 û deynê xeyrî neqdî yê cotkaran jî ji %1519 zêde bû.
- Di sala 2018an de cotkaran ji hilberîna çandiniyê 40 milyar TL qezenc kir, lê 45 milyar TL deyn tehsîl kirin. 5 milyar TLyê mayî jî an bi karekî din tehsîl kirin, an jî ew bûn deyndarên banke û selefxuran.
- Ji milyonek 964 hezar dekar cihê çandiniyê, jê 39,5 milyon dekar bi îpotek in. Ji %92yê tapûyên cotkaran, ji ber deynên wan hatine îpotekkirin. 8 hezar cotkar niha bûne îcrayî.
- Di sala 2002an de 41.200 hektar erdê cotkariyê hebû, lê di sala 2018an de ev mîqdar bû 37.8000.
- 2 milyon kesên ku debara xwe bi cotkariyê dikirin, niha bêkar in.


## PIŞTGIRÎ KÊM E, MALIYET ZÊDE DIBE

- Li gorî yasaya di sala 2006an de hat qebûlkirin, divê ji %1ê Dahata Neteweyî ya Sade ji bo çandiniyê bihata terxankirin, lê AKPê tu carî ew meblax neda.
- Ji sala 2007an heta niha, divê li gorî yasayê 177 milyar TL bidana hilberîneran, lê ew nehate dayîn.
- Li gorî sala 2017an de buhayê gubreyê ji %100, mazot ji %40, êm ji %50 zêde bû.
- Di navbera 1ê Cotmeha 2017an û 1ê Cotmeha 2019an de di avdaniya çandiniyê de buhayê elektrîkê ji %126,2 zêde bû.
- Di avdana çandiniyê de buhayê elektrîkê ji %126,2 zêde bûye.

## COTKARÊN DEYNDAR ÊDÎ DEV JI HILBERÎNÊ BERDIDIN

- Li gorî pergala qeydiniya cotkaran, ji sala 2003an vir ve, 700 hezar cotkar ji pergala qeydiniyê ya cotkaran veqetiyane, ji ber ku cotkar êdî naxwazin hilberînin.
- Di dîroka Komara Tirkiyeyê de, cara yekem e cihên çandiniyê ketine bin 20 milyon hektaran.
- Rêjeya tevahiya cihên çandiniyê, ji sala 2001an heta niha ji %8 kêm bûye, cihên çandiniyê yên ku tên ajotin, di 20 salên dawî de ji %12 kêm bûne.




**EM POLÎTÎKAYÊN NEOLÎBERAL ÊN AKPÊ QEBÛL NAKIN!**
**JI BO KU COTKAR BIKARIBIN DEYNÊN XWE BIDIN PÊŞNIYAZÊN ME HENE:**

Em wek HDP dibêjin ku;

- Divê deynên cotkarên ne dewlemend, bêşert û merc, wek deynên qamûyê bê qebûlkirin û ji aliyê dewletê ve bê tehsîlkirin,
- Divê banka kooperatîfê ya ji bo krediyên cotkaran bê avakirin,
- Divê piştgiriyên çandiniyê bi periyodên 5 salan bên diyarkirin û beriya debrê bên dayîn,
- Ji bo ku rê li ber talana cihên çandiniyê bê girtin, divê cihên çandiniyê wek qada SÎTê bên îlankirin,
- Divê demildest polîtîkaya hilberînê ya çandiniyê ya derhanînê bê terikandin,
- Divê ji ber deynên wan, erdên çandiniyê û amûrên hilberînê yên din neyên desteserkirin

@HDPekonomi, hdpekonomibulteni@gmail.com, Hûn dikarin fikr û rexne û pêşniyazên xwe ji me rebişînin.

.